Bo sazî û dezgehên çand û wêjeya Kurdî yên Rojavayê Kurdistanê

Xelata Hevgirtina Rewşenbîrên Rojavayê Kurdistanê(HRRK)ê ya afirandinê, sala 2016an li Qamişloyê hat damezirndin. Xelat ji alî Komîteya Kargêr a HRRKê tê dayîn û birêvebirin. Bihayê xelatê 1000$ û mertalek e.

Mebesta xelatê ew e ku rola afrînerên kurd destnîşan bike û keda wan a ji bo geşepêdayîn û pêşvebirina çand û wêje û hunera kurdan bipesinîne û li qelemê bide. Her wisa piştgiriyê bide cîhana afirandin û dahênana rastîn di warên raman û hişyarî û zanînê de .

Pîvanên HRRKê ji boyî hilbijartina kesê xelatwergir ev in ku, mirovekî xawen serborî be, ku di gorepana çand û têramandinê de bi bandor be, ku li Rojavayê Kurdistanê û li Sûryayê xebata xwe berdewam dike.

Bi vê boneyê, HRRKê dergehên xelata 2019an ji bo berbijêran vedike û ji hemû sazî û dezgehan tika dike û ew jî ji aliyê xwe ve beşdarî pêşniyazkirina berbijêran bibin da ku em bi hev re afirînerekî hêjayî xelatê hilbijêrin.

Hêjayî gotinê ye ku sponserê Xelata 2018an karsazê kurd Ekremê Gemo bû û sponserê Xelata 2019an a îsal jî karsazê Kurd Kamran Hewrran e, jixwe her du karsaz li Elmanyayê rûdinin.

KOMÎTEYA KARGÊR A HEVGIRTINA REWŞENBÎRÊN ROJAVAYÊ KURDISTANÊ(HRRK)

01.06.2019
Qamişlo